

Dengê her Kurdekî
dikare dîsa rejîmê rake
ser piyan

»»» R:7



Sala nû, sala
xweamadekirin ji
guhartinan re

»»» R:4




*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (395) 04-04-2021 Buha (1000) Tûmen

Di Nava Gerrên
Ejdeha De

»»» R:5



Rûsiya û hewl-
danên sext

»»» R:8



Şehîd bilindahiya çiyayê bawerê ye

Wek dab û nerîta
hemû salekê bi
amadebûna rêberay-
etiya Hizba Demokrat,
kadr û pêşmerge û
malbatên şehîdên
serbilind yên Kurdis-
tanê di rêûresmeke
mezin de, roja 10`ê
Xakelêwe, roja Şehîdên
Kurdiştanê bilind hate
nirxandin.

Roja Duşemî 29ê
Adarê, rêûresma
10`ê Xakelêwe, roja
Şehîdên Kurdiştanê
ku di 3 beşan de pêk
hatibû, bi rê ve çû.
Di beşa yekem de,
beşdarbûyên rêûresmê
bi pêşengiya rêjeya
nizamî ya Hêza
Pêşmerge Kurdiştanê,
serdana tîrbên pîroz
yên şehîdan kirin.

Piştî li ser tirba
şehîdan sirûda “Ey
Şehîdan” ji aliyê
hunermend “Xulam
Fatihî” û Hêza
Pêşmerge Kurdiştanê
ve hate xwendin. Her-
wisa sirûda “Merêjin
Bom Firmêskî Xem”,
ji aliyê beşdarbûyên
dewreya 248 a deşt-
pêkî ya pêşmerge ve
hate xwendin.

Piştî tacegulek bona
rêzgirtin û emegnasî
li ser rêbaza pîr ji
serweriya şehîdan, ji
aliyê Lêpirsyarê Giştî
yê PDKÎ, “Mîstefa
Hicrî” û “Nezîre Ehm-



edî” ku hevjinê nûtirîn
şehîdê PDKÎyê şehîd
“Îqbal Elî Remayî” ye
û herwisa Ebdullkerîm
Celalî, birayê şehîd
“Sebrî Celalî” ve li
ser tirba şehîd “Selam
Ezîzî” hate danîn.

Di beşa duyem
a rêûresmê de,
pêşangeha wêne û
yadigariyên şehîdan ji
aliyê beşa Şehîdan a
Komîsiyona Komel-
atiyê ve hatibû ama-
dekirin, ji aliyê “He-
sen Şerefî” Cihgirê
Yekem yê Lêpirsyarê
Giştî yê PDKÎ û ber-
pîrsê “Navenda Siyasetî
ya PDKÎ”, û herwisa ji
aliyê “Amîne Dadîlî”
keça “Mela Kerîm”, û

xwîşka şehîd “Mîstefa
Dadîlî” û herwisa
Şemal Hacîresûlî
birayê şehîd “Sultan
Hacîresûlî” ve, bo
beşdarbûyên rêûresmê
vekirin.

Para dawî ya rêûresmê
bi sirûda netewî ya
“Ey Reqîb” û ragirtina
bîstekê bédengî bona
rêzgirtin li riha paqij a
şehîdên Kurd û Kurdis-
tanê, deştê kir.

Piştî peyama Komîsi-
yona Komelayetî ya
PDKÎ, ji aliyê ma-
moştê “Ehmed Re-
hîmî” berpîrsê wê
Komîsiyonê ve hate
pêkêşkirin.
Piştî sirûdek bi navê

“Şehîd Gulî Çiyayî Berz” e ji aliyê zarokên Aza-
diyê û bi serpîrsayetiya “Xedîce Behmen” ve,
hate pêşkêşkirin.

Herwisa peyama hevpar a rêxistinên demokrat
ên “Lawan, Jinan û Xwendekaran” ji aliyê “Ce-
mal Fethî” Sekreterê Yekîtiya Xwendekaran ve,
hate pêşkêşkirin.

Ev rêûresm bi çend helbest û stranên bi xem ji
aliyê “Fetah Sebzewarî” hunermendê Kurd ve
dawî pêhat.

Hevdem li kempa Cêjnîkanê ya PDKÎ û herwisa
li çiyayên Kurdiştanê rêûresma taybet bi roja
Şehîdên Kurdiştanê bi rê ve çû.

Ji aliyek din ve jî, îsal wekî salên derbasbûyî li
piraniya gund, bajarok û bajarên Kurdiştanê yad
û bîra şehîdên Kurdiştanê bi çalakîyên cuda ji
wan, çalakîyên banghêjî, serdankirina malbatên
serbilind yên şehîdan, serdankirina tîrbên şehîdan
û danîna gulên wefa û xemilandina wan bi axa-
banû û bilindkirina alaya Kurdiştanê bilind ragir-

Sergotar

Gola nearam

N: Kerîm Perwîzî

Êvarê genc û ciwanên gund, dar kom kiribûn û dixwaştin agirê Newrozê, ev agirê pir ji nîşane û hêmayên netewî hil bikin, ku ji nişkê ve pêşmerge derketin, gurra agir ji wan standin û agirê wan hilkin! Di wê demê de netenê xelk, belkî tev surûştê derdor jî, bi heyrîmayî çav ji wê agirê dikir! Agirê Newrozê ku pêşmerge bo nîştiman hil bike, tu bêjî çi peyamek pê be?

Di wê demê de sedan kîlometr vêdetir, di kuncêke din a nîştiman de, êvar bû û xelkê bajar mijûl bûn hêdî hêdî herine mal, ku ji nişkê ve desteyek ji hezkirî-tirîn xortên nîştiman, wate pêşmergeyên Kurdistanê hatine nav şeqam û bi dengê bilind û bi alaya Kurdistanê hawar kirin ku peyamek bo wê Newrozê li cem wan e.

Piştî saleke teji ji bela ku dagîrker zêdetir hewil dida rojreşîyan zêde bike, pêşmerge bi alaya xemilîn û meşxelên Newrozê ve çûne nav xelkê û peyameke asayî li cem wan bû: “Em di nav hundirê nîştiman û netewa xwe de ne, em we bitenê nahêlin”.

Piştî du hefteyan, li çiyakî bilind ê Kurdistanê, alayeke pir mezin bejna çiya veşart û têkoşerên gel hevdem digel bilindkirina alayê, peyama pêşmergeyên xwe jî dubare kirin.

Ew bûyerane herçiqas asayî tene ber çav û belkî wisa bizanin ku hemaseyeke mezin nehatiye afirandin, lê raştiya jîngeha siyasî û hizriya wê, coreyeke din e.

Peyama sersaxî ya Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ derheq koça dawî ya “Remzî Şe`iban”



Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, “Mîstefa Hicrî”, bo koça dawî ya “Remzî Şe`iban” Endamê Serkirdayetî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), peyameke sersaxiyê belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Rêzdar/ Cenabê Mesûd Barzanî

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK)

Tevî silav û hurmet

Nûçeya koça dawî ya Xwedîlêxweşbûyî Remzî Şe`iban, Endamê Serkirdayetî û Kadrê bikêrhatî û lêzan yê Partî, cihê nerihetîya me hemûyan e. Bi vê hilkeftê ve, em sersaxiyê li te yê rêzdar, Rêberayetiya Partiya Demokrat a Kurdistanê, malbat û kesûkarên wî rêzdarî dîkin û em xwe di xemên we de pişkdar dizanin.

Digel rêz û hurmetên dûbare

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

15`ê Xakelêweya 1400`an a Rojî
4`ê Nîsana 2021`an

Civatgeha Kurdistanê hişyar e û neraza ye da ku bi wan hereketên pêşmergan veciniqin û rabine ser xwe, belkî tiştek din rastî perîşaniyê hatiye û herçiqas hewil dide ku xwe nîşan nede, lê perîşaniyên wê zêdetir dibin û goma wê, lê tê şilqandin.

Dagîrker hewla zêde daye ku bêje, Rasan tenê çend kiryareke demkurt a leşkerî ye û bi êrîşa leşkerî û mûşekbaran û teknolojiyaya pêşketî ya Rûsî û Çînî, serkut dike, lê peyama Newroziya îsal ya pêşmergeyên, tev direw û çîrokên xiyalî yên wan vala derxistin û dujminê dagîrker evê ku çavê wê/wî ji hişyarî û mafxwaziya netewa Kurd û evîndarê alaya bilind a nîştimanê bilind nabe, rastî veciniqînê aniye ku Rasan û xebata Kurd, tiştek ji wê aliyê sînoran û tenê çend kiryareke leşkerî a demkurt nîne, belkî heqîqeta wê eva ye ku:

Rasan hezkirî ye bo nîştiman û îrade ye bo berdewamî.

Her çawa ku rêberê mezin gotiye, di dîrokê de nehatiye tomarkirin ku neteweyek amadeya dana nîrxazî azadiyê be û dujminan karîbin wê reş bikin. Her lewma amadebûna pêşmerge bi alaya sermilê wan ve di nav xelk û xemilandina çiyayên Kurdistanê bi alaya bilind a nîştimanê û renge dehan kiryarên din yên dahênerî jî li pey be, ev givaşa giran e ku pantahiya xiyalên koloniyalîstan dişilqîne û xewnê wan ji wan dirizîne.

Yad û bîra şehîdên Kurdistanê di binkeya sereke ya PDKÎyê de bilind hate nîrxandin

1 0'ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdisatanê, wekî adetê hemû salan bi amadebûna rêberatiya PDKÎ, kadir û pêşmerge û malbatên şehîdan, di rêûresmeke bi şan de bi bilind hate nîrxandin.

Roja Duşemî 29ê Adarê, rêûresma 10ê Xakelêwe, roja Şehîdên Kurdistanê ku li 3 qonaxan pêk hatibû, bi rê ve çû.

Di qonaxa yekem de, beşdarbûyên rêûresmê bi pêşengiya rêjeya nizamî ya Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê, serdanê goriştana pîroz a şehîdan kirin.

Piştê li ser tirba şehîdan sirûda "Ey Şehîdan" ji aliyê hunermend "Xulam Fatihî" û Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê ve hate xwendin.

Herwisa sirûda "Merêjin bom firmêskî xem" ji aliyê beşdarbûyên dewreya 248 a destpêkî ya pêşmerge ve hate xwendin.

Piştê tacegulek bona rêzgirtin û emegnasî li ser rêbaza pir ji serweriya şehîdan, ji aliyê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, "Mîstefa Hicrî" û "Nezîre Ehmedî" ku hevjinên nûtirîn şehîdê PDKÎyê şehîd "Îqbal Elî Remyî" ye û herwisa Ebdilkerîm Celalî, birayê şehîd "Sebrî Celalî" ve li ser mezarê şehîd "Selam Ezîzî" hate danîn.

Di qonaxa Duyem a rêûresmê de, pêşangeha wêne û ya-digariyên şehîdan ji aliyê beşa Şehîdan a Komîsiyona Komelatiyê ve hatibû amadekirin, ji aliyê "Hesen Şereftî" Cihgirê Yekem yê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ û berpirsê "Navenda Siyasî ya PDKÎ", û herwisa ji aliyê "Amîne Dabîlî" keça "mela Kerîm", û xwîşka şehîd "Mîstefa Dabîlî" û herwisa Şemal Hacîresûlî birayê şehîd "Sultan Hacîresûlî", ve, bo beşdarbûyên rêûresmê vekirin.

Para dawî ya rêûresmê bi



sirûda Netewî ya "Ey Reqîb" û ragirtina biştekê bédengî bona rêzgirtin li riha paqije şehîdên Kurd û Kurdistanê, destpêkir.

Piştê peyama Komîsiyona Komelatiyê ya PDKÎ, ji aliyê Mamoşa "Ehmed Rehîmî" berpirsê wê Komîsiyonê, ve hate pêşkêşkirin.

Piştê sirûdek bi navê "Şehîd gulî çiyayî berz e" ji aliyê zarokên Azadiyê û bi serpirsatiya "Xedîce Behmen" ve, hate pêşkêşkirin.

Herwisa peyama hevpar a rêkxistinên demokrat ên "Lawan, Jînan û xwendekaran" ji aliyê "Cemal Fethî" Sekirtêrê Yekitiya Xwendekaran ve, hate pêşkêşkirin.

Ev rêûresm bi çend helbest û stranên bi xem ji aliyê "Fetah Sebzewarî" hunermendê Kurd ve dawî pêhat.

Li Cêjnîkanê rêûresma 10'ê Xakelêwe hate lidarxistin

Roja Sêşemî 10'ê Xakelêwe-Reya 1400'an, li Cêjnîkanê bi hilkefta 10ê Xakelêwe roja Şehîdên Kurdistanê rêûresmeke mezin bi rê ve çû.

Ev rêûresme bi sirûda netewî ya "Ey Reqîb" hate destpêkirin û piştê bo rêzgirtin li canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê çend xulekê bê deng sekînan.

Piştê peyama "Komîsiyona Komelatiyê" bi hilkefta 10'ê Xakelêwe, ji aliyê "Mela Elî Asrîs" ve hate xwendin.

Paşê sirûdek di bin navê "Nîştîman" de, ji aliyê girûpa zarokan ve hate pêşkêşkirin.

Di beşeke din a vê rêûresmê de mamoşa "Bêbeş" helbestek di bin navê "Şehîd" de pêşkêşê amadebûyan kir. Paşê her dîsan zarokan sirûdek din pêşkêşê amadebûyan kir.



Piştê "Nesrîn Babekirzad Eqdem", bi hilkefta 10ê Xakelêwe peyama hevpar a Saziyên Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdistanê Îranê (YLDKÎ) û Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdistanê Îranê (YJDKÎ) xwend.

Di beşeke din a rêûresmê de, ber bi goriştanên şehîdan ve bi rê kevtin û Hêza Pêşmerge

Kurdistanê bi rêjeya destçek çûne ser tîrbên şehîdan.

Di vê beşa rêûresmê de sirûdek di bin navê "Şehî Bew Zameyê Dira li Cergit" li ser tîrbên şehîdan hate pêşkêşkirin.

Herwisa tacegulîneya rêz û wefayê ji aliyê "Mehnaz Çigînî û Rehîm Mengûrî" ve, li ser tirba şehîd "Rehîm Pûr Îbrahîm" hate danîn.

Di dawiya rêûresmê de zarokan gulê sor li ser tîrbên şehîdan danîn.

Sala nû, sala xweamadekirin ji guhartinan re!



N: Nûredîn Sofîzade

Me pê avêta nava saleke nû û sedsaleke nû, mebest gorî tarîxa sedsala “Koçiya Rojî” ye, em kevtine nava sala 1400`ê, û sedsala 15`an ya Hetawî.

Ez di wê nivîsê de naxwazim basa derbasbûyî û sedsala bihorî bikim û gilê û gazindan ji xebat û rewşa me Kurdan bikim û bêjim ka me çi kir? Kêmasî û rexnên li ser doza me çi ne, û dujmin û dagîrkran çi cure pîlan û nexşên xwe yên qirêj li ser Kurdan bi rê ve birine, herçiqas di berê de hatiye gotin ku ezmûn û derbasbûyî dikare bibe wane û ceribandinekî baş, bo bi xwe de çûnê û nehêlan yan kêmkirina kêmasiyan û bihêz kirina notên erênî, belkî ez dixwazim raşterast biçime ser vê mijarê ku em di pêşerojê de dibe çi bikin?

Gelê me yê Kurd niha di serdemê pêşkevîna teknolojiya û informatîkê de dijî û bê guman bi beravirdkirin digel sedsala derbasbûyî, gelek guhartin bi ser awayê nêrîn, hişyarî, heşt, û zaniyariyan de hatiye.

Gorî wan guhartinan ku bi ser dinayê de hatine û hekî gotî dewlet serê teknolojiyê û emrazên peywendîgirtinê, cîhan bûye gundekî biçûk. Pirsyar ava ye ku emê Kurd di çi qonaxekê de ne û me heya çiqasekê kariye xwe digel wê guharinê rêk bixin? Bi berçavgirtina wê raştîyê, divê Kurd gelek lezgîn siwarê pêlên wan guhartinan bibe û digel de here pêş. Kurd bi giştî nikare her bi awayê kevneşopî û sunnetî weke derbasbûyî doza xwe bimeşîne û xebatê bike bona



bideştvegirtina qedera xwe, belkî ev jî, dibe guharinê bi ser xwe de bîne.

Bo mîna di demekê de ku dagîrkaranê Kurdiştanê hemî cehda xwe dikin ku bona derbelêdan ji xebata Kurd, mifahê ji baştirîn emrazên serdem wergirin, Kurdan heya çiqasekê karîne bi armanca pêşxistina xebata xwe, xwe digel teknolojiyayê rêk bixin?

Rejîmên dagîrker û bi taybetî hekî ez bi rohnî bêjim rejîma kevnarperwer û terorîst a Îranê, hekî berê bi tang û teyaran û topan û êrîşa leşkerî, cehd dikir gelê me bifetisîne, li Kurdiştan bi hegera komkujiya ji aliyê rejîmê ve, çemê xwînê diherikî. Em dibînin ku îro rojê şewaza şerê xwe guheriye û taktîkên gelek metirsîdartir ji komkujiyan girtiye bera xwe bona şikandina xebat û berxwedanê û kerameta Kurdan li Rojhilatê Kurdiştanê.

Rejîm di cihê çek û cebilxana teyar, îro dehan hezar kadrên saybêrî perwerde kirine û emrazên herî pêşkevî danane ber deştê wan, ku şerê hewce bi wan bide kirin.

Ew şer şerê nerm e, êrîşe bo ser pîroziyên netewî, lêdan ji çand û kultûra Kurdan e, şikandina keramet û îrada netewî ye, bê bawerî xistina di nava Kurdan de ye, ev hin ji awayê êrîşên serdemiyane

yên rejîmên dagîrker û bi taybetî rejîma Îslamî ya Îranê ne.

Lê her bi wê hinê nasekîne û cehdê dike derbên giran ji tevgera Kurd bide, weke netebayîxistina di navbera part û aliyên siyasî de ku di cihê xebat bi dijî dagîrker, mijûlê xwe xweriyê û dijayetiya hevdu bikin.

Cehdkirin bo nifûzkirin di nava bizava rizgarîxwaza Kurd û lêdana derbên emniyetî, da ku her rojekê bixwazin morên xwe bikar bînin. Bernamên televîzonî û radiyo û rojname û sedan malper terxan kirine bona piropagende li dijî tevger û hêzên xebatkar yên Kurd, tenê bi armanca lekedarkirin û bixtan pêkirin û ber çavê xelkê reş kirina hizbên siyasî, xistina kar.

Em wekî doza berheq a Kurd hewce ye ku di wan warane de pêngavên micid biavêjin, hem bona gihîştina bi armancên netewî yên xwe ku rizgariya Kurdiştanê ye, hem bona bertek û berevanîkirin digel pîlanên dujminan û şerê wan ku ji teknolojiya herî pêşkevî a serdem bi dijî me bikar tînin.

Renge hêzekî şoreşger û di halê xebatê da be nekare rikeberiya teknolojiyê û bikaranîna wê digel dewletekê bike, hekî me seh bi wê raştîyê kir, tenê dimîne çend

pêngavên hewce ku bikarin rû bi rûyê dujminan bibin û pîlanên wan pûç bikin ku ew jî ev in:

Çêkirina yek gotarî di nava bizava Kurd de.

Çêkirina yekîtiyeke bihêz di navbera partiyên xebatkar de Yekgirtina li ser mijarên hevpar ên xebatê li dijî dujminan.

Birina serê ya asta hişyariya xebatkarên siyasî û haydarkirina wan ji pîlanên dujmin Birina serê ya asta ewlehî û tenahiyê li hember kiryarên terorîstî.

Parastina nihênîyên rêkxistinî û belavnekirina wan li ser torên civakî.

Çêkirina girûpên saybêrî bona berengarbûn ji êrîşa saybêriya dujmin.

Çêkirina girûpên berteknîşander li hember her piropagendeyekî dujminan di torên civakî de.

Ev û gelek warên dinê ku renga li ber pirsên ewlehiyê hewce nekin ku di wê nivîsê de bîne baskirin, dikarin xebata tevgera rizgarîxwazî ya Kurd bi giştî û li Rojhilatê Kurdiştanê bitaybetî rîjd bike.

Bi awayekê ku heya qasekê bikare berengarê pîlanên serdemiyane yên rejîmê bin.

Di Nava Gerrên Ejdeha De



N: Serbest Urmîye

Piştî heyemeke dirêj û bi naverokeke nepenî û şêlû, di dawiyê de û di heftiya derbasbûyî de, peymannameya hevkarîyê di navbera Çîn û rejîma Îranê de hate wajokirin. Berî ku em bal bikeşînin ser peymannameya hevkarîyê di navbera rejîma Îran û Çînê de ku bo heyamê 25 salan dewleta Çînê dike şîrîk yan em bêjin mîrav di çavkaniyên enerjîya Îranê de, gotina “Daniel Seth Markey” mamostayê zanîngeha “Johns Hopkins University” a Amerîkayê, derheq siyaseta têkilîyên dewleta Çînê bi dewletên derdor re, balkeş e. Ew di pertûka xwe ya bi navê “China’s Western Horizon: Beijing and the New Geopolitics of Eurasia” de wate asoya rojavayî ya Çînê: Pekîn û jeopolîtîka nû ya “Eurasia”ê de wiha tîne ziman ku Rojhilata modern netenê çavkaniya mezin a enerjîyê ye, belkî navenda hevkeşe û pîrsgirêkên siyasî ye û hertim ji navend û başûrê Asiyayê pitir meydana hevrikiya zilhêzan bûye. Di kevin de têkilî di navbera Çîn û Rojhilata Navîn de hebûne, lê piştî bi dawîhatina şerê sar di wê herêmê de, xwesteka sereke ya wî welatî di warê bazerganî û aboriyê de, pitir bi destxistin û bideştveanîna çavkaniyên enerjîyê ye.

Nivîskar di pertûka xwe de bal dikeşîne ser mifahwergirtina dewleta Çînê ji hevrikî û pîrsgirêkên du deh salên borî yên di navbera Îran û Erebiştana Siûdî de. Bi baweriya wî dewleta Çînê daye xuyakirin ku di nebûna azadiyên siyasî de derfet bo geşekirina aborî dest dikeve. Lewma him Îran û him jî



Erebiştan, zêde alîgirê berfirehbûna têkilîyên aborî û sermayedanîne tevî Çînê ne. Herçend ku di guhkêşkaneya bihêztirkirina peywendîyan bi Çînê re aliye birî û dorandî ne kifş e, lê ne rejîma Îranê û ne jî ya Erebiştanê amade ninin ku dev ji destkevtên xwe ji bihêzkirina peywendîyan bi wî welatî re berdin.

Çîn di wê peymannameyê de çi dişopîne?

Herçend ku mebesta rejîma Îranê ji wajokirina peymannameya hevkarîyê bi Çînê re kêmkirina bandora dorpêçan e ji bo baştirkirina rewşa aborî ya welat. Lê ev ne bi wateya jordebirina rewşa aborî û astê jiyana xelkê tê dîtin. Belkî ji bo vê çendê ye ku bi dahata ku di wê peymannameyê de dest rejîmê dikeve, hevalbendên xwe yên herêmî li dijî hevalbendiya cîhanî û pitir jî li dijî Amerîkayê bihêz bike.

Eva ku “Daniel Seth Markey” di derheq nebûna azadiyên siyasî de tîne ziman ku derfetên baş dayîne destê welatê weke Çînê ku hêlên geşekirina xwe ya aborî pê berfirehtir bike, di derheq Îranê de pitir balkêş e. Jiber ku di hemû heyamê ku hewla girêdana girêbesta hevkarîyê di navbera Çîn û rejîma Îslamî ya Îranê de hatiye dayîn û heya niha ku ev girêbest bi fermî hatiye wajokirin, ji bilî taqimek ji berpirsiyarên rejîmê, ne gel û ne jî aliye rejîmê yên

dijberî taqima desthilatdar haydarî naverok û encamên vê nebûne û ninin. Di demekê de ku Çîn mijûlê pirojeya rêya nû ya Ebrîşem e ku tê de û di herdu rêyên av û axê de ticareta pitirî 60 welatan ku 60 jî sedî li şêliya (nifûsa) cîhanê li xwe digirin bi hev re tê girêdan, pira niya welatên cîhanê mijûlê vexwandîneke nû ne li dor peymanên xwe yên aborî bi dewleta Çînê re û di gelek welatan de têkilî û lihevhatinên aborî bi Çînê re yê bûne mijara qada hilbijartinan. Ji aliyeke din ve herifîna aborî ya piştî peydabûna nexweşiya Koronayê jî, yê bûye sedem ku pêvajoya pêdeçûnê bi ser peymannameyên han de xurtir bibe. Bi terzekê ku welateke weke Tanzaniyayê girêbestên xwe yên ku bi deha miliyar Dolaran hatine texmînkirin, bi dewleta Çînê re hiloşandin. Di rewşeke wiha de Çîn li pey welatên hejar û nemaze di warê bingeşî yê avadanî û pêşesaziyê de digere ku Îran jî serbarê dewlemendbûnê di warê enerjîyê de, lê jiber nebûna sîstemeke demokratîk a siyasî û aborî, yek ji wan welatan e.

Bi kurtî û li gor hin şîroveyan ya ku Çîn bi wajokirina peymannameya han bi Îranê re dişopîne, wiha tê zanîn:

-Bi nasandina Îrana xwedî neft û çavkaniyên zaf yên enerjîyê û pêşesaziya wêran weke hevalbendeke stratejîk di pirojeya rêya nû ya

Ebrîşem de, ji çavkaniyên enerjîyê yên Îranê jî, ji bo serxistina pirojeya xwe ya han mifahê werbigire.

-Dewleta Çînê ji aloziyên di navbera Îran û Amerîkayê de weke derfeteke zêrîn mêze dike ji bo ku bikare enerjî û bixasmanî jî, nefta Îranê bi erzanî bi dest xwe ve bîne. Lê bi sedema baykot û dorpêçên cur bi cur yên Amerîkayê nemaze di heyame dewleta “Donald Trump” de, heya qasekê jê re diwar bibû. Lewma ye ku bi wajokirina peymannameya han, rêber û taqima desthilatdar a rejîma Îranê han dide ku li dijî Amerîkayê xurtir bisekinin, bi vê hêcetê ku ev peymanname dê bibe sedem ku dewleta nû ya Amerîkayê neçar bibe ku xwestekên Îranê bipejirîne û bi hilgirtin yan siviktirkirina baykot û dorpêçên aborî, siyasî, leşkerî û ...hwd, car din wegere ser rêkveştinnameya navîkî (Bercam)ê û vê demê de derfetên bêtir ji bo berfirehtirkirina derfetên aborî yên Îranê nemaze bi Çînê re werin hole.

-Ji aliyeke din ve tê gotin ku Çîn hewil dide ji Îranê weke karteke zextê li hember Amerîkayê mifahê werbigire da ku bikare aloziyên di navbera xwe û Amerîkayê de li dor dorpêçên aborî yên ku dewleta “Donald Trump” bi ser Çînê de sepandibûn û aloziyên li dor Hong Konge û behra başûrê çînê, bi dawî bîne.

Birîna Nava Kurdên Bakur; Asîmîlasyon û Entegrasyon

N: Zaniyar Amedî

Di parçekirin û parvekirina welat de dewleta kolonî gor navxweyî welat, jiber taybetmendîyên avahîyên Kurdan gefên xwe avêt. Yek ji taybetmendîyên avahîya Kurdan, netewîbûn çalekvanên doza xwebûn. Di wê warê doza netewî de serpêhatîyên wan ên kevn hebû. Bi nirxan, daxwazên netewî ji xwe re kiribûn remz û dewletên kolonî jî hemberê Kurdan bi xwîn êrîş dikirin. Ew ji bala dewletên dervayî bo aliyê xwe dikişand. Hemberên êrîşa dewletên kolonyalist, Kurd hertim xwedîyê serpêhatîyan bûne. Dewleta kolonî jî, gor helwesta Kurdan û dewletên derveyî li navxwe, serwerîya pergala xwe di tekoşînê de û bi kuştin/çavtirsayî serwerîya pergala dagirkerî domand.

Hemberê ew helwesta dewleta kolonî Kurd, xwe bi rêxistin û dubareyên serhildana dikir, ew helwesta Kurdan jî ne dihat hesabê stratejîya dewleta kolonî ku Kurdan bi serhildanan re bûn yek û wek zincîr bûn.

Li cîhanê dezgeyên mafê mirovan, hizrên azadîxwazî û gelek dezgehên demokrat berfireh bûne. Herwaha pîrsa kolonyalistî û mafê çarenîvîsiya gelan li cîhanê derket holê. Pîrsgirêka wek Kurd, kete rojeva cîhanê û konjektorên dervayî hatin çêkirin.

Serhildanên Kurdan li her çar parçan hate meşandin, bandor li hev girêdan.

Dewleta kolonî jî, gor konjektorên dervayî bandor li Bakurê welat hebû. Xwest ku Kurdan polîtîze bike, berê siyaseta Kurdan bide navenîya pergala serwerî ya xwe. Kurdan hem ji hişmendîya neteweyî dûr bixe hem jî, bi wan fikrên polîtîzekirinê berjewendîyên xwe li Rojhilata Navîn raşt bike, Da ku Kurdan polîtîze bike û bike yekemîn siyaseta pergala serwerîya dewletê;



Eşîretan di bin serwerîya xwe de parçe bike û bike komele, medereseyên olî ji çanda Kurdewarîyê derxe û bêxe bin pergala xwe, komeleyên Zaza û Elewîyan ava bike, herwaha bi organên deshilatê ve rêxistin, komele û partî çê bikin. Wan xwaştin ku bingeh û xwesta xeta netewî tone bike. Kurdan ji zincîra serhildanê biqetîne. Niha li Bakurê welat rewşa Kurd eva ye. Kurdên Bakurê polîtîzekirî/entegrasyon û beşê pergala dewleta kolonî de bin pergala in.

Asmîlasyon, bi magezagonên dewleta kolonî înkariya Kurdan û nirxên wan dike, ev jî beşeke ji rêya sazîyên dewletê re ye. Dewlet bi hemû hebûna xwe ve bi asmîlasyonê pozîsyon daniye. Herçiqas TViyên Kurdî yên ser bi deshilatê li zanîstgeha beşên zimanê Kurdî veke jî, ew xwendevanên ku zimanê Kurdî dixwînin di pergala dewletê de nikarin ser beşên xwe kar bikin, û ew beş li zanîstgeha niha ketîye di nav valahîyê de. Dewlet paşê dibêje; Kurd ne bi zimanê Kurdî re ne, perwerdehiya zimanê Kurdî tinebe jî, dibe. Qanûna xwe û pîrsgirêka kolonî û înkari ser Kurdan, li ser xwe vêde dibe. Ew rewş bê neraştîbûna dewletê derdixe holê. Bi entegrasyonê paraştina nirxan lawaz dike.

Jiber ku avahîyên parêzvanên nûner ên entegrasyon pîrsgirêka Kurd, pîrsgirêkekî netewî nabîne û bi çand û demokrasî nav dikan, Ji nirxan dûr dizane, û gel polîtîze dike û asmîlasyonê jî xortir dike.

Li Bakur, dewlet entegrasyon û asmîlasyonê bi rê ve dibe. Pîrsgirêka netewî digihîne bê çareserîyê. Entegrasyon raştîya pîrsgirêka netewa Kurd nîşan nade, bi nûnerî yekîtiya Elewî, Sunî, Îzidî, Ermenî, Kurd, Tirk, Laz û Çerkez tîne ziman. Ew helwest raştî, safîkirina cûdahîya di navbera gelên serdest û bindest, netewe-ol ji hev nake, pîrsgirêka Kurd ser hişmendîya xwe diavêje. Entegrasyon, hişmedîya serwerîya pergala gelê serdest, yek dewlet, yek millet, yek al û yek welat e û di seranserê Kurdistanê de pîrsgirêka Kurdan difetisîne. Ew rewş yekîtiya neteweyî bê çareser dike. Di her aliyê de birînekî mezin e di navbera Kurdan de.

Bi kurtayî, ger em bêjin, asmîlasyon hertim ji aliyê dewleta kolonî ve tê meşandin ev yeka raşt e. Çimkî ew entegrasyon jî, bi plangêrîyeke projeya dewleta Kolonî, ji aliyê hen Kurdan ve dibe pêşeng. Dewleta kolonî hemberê Kurdan bi kuştin nasekîne, ev bi entegrasyon û asmîlasyonê bi rêxistinên qanûnî, wan tine dike.

Nerîna Lîderan



“Jean-Yves Le Drian”:
“Binpêkirina rêkvevtina Bercamê ji aliyê Îranê ve, cihê nigeraniyeke mezin e.”



“Feysel Bin Ferhan”:
“Asayîbûna rewşa Îsraîl li deverê, dê bandoreke baş li ser Rojhilata Navîn hebe”.



“Mihemdcewad Zerîf”:
“Hewce nake em digel Amerîkayê hevdiştinê bikin”.



“Seîd Xetîbzade”:
“Em rakirina tehrîmên pêngav bi pêngav qebûl nakin, dibe tev ew dorpêçên serdemê “Donald Turamp” û tev dorpêçên din yê ser Îranê ku bi her navûnîşanek û sedemê bi ser me de hatine sepandin, bêne rakirin”.

Dengê her Kurdekî dikare dîsa rejîmê rake ser piyan!



N: Eskender Ceiferî

Êdî 13emîn gerra hilbijartinên serokkomariya Îranê nêzîk dibin. Aliyê ku xwe weke Eniya Reformê binav dike, di nava Kurdan de her tim dengên xwe bi şewazên curbicur misoger dike. Bi nêzîkbûna hilbijartinên vê gerrê yê serokkomariya Îranê jî liv û tevgerên wan di nava Kurdan de zêde dibin.

Berpîrsên rejîmê yê reformxwaz di demên nêzîkî hilbijartinê de serdana Kurdiştanê dikin ji bo ku xelkê bîkşînin ser sindûqên dengdanê.

Ew dizanin ku Kurdan, azadîxwazbûna xwe berî hemû neteweyên din nîşanî wan daye û lewma jî ji bo wan gelek girîng e ku Kurd biçin ser sindûqan.

Tevî ku pîrsgirêkên Sipaya Pasdaran û rêxistinên ser bi wê ve bi Reformîstên nêzîkî Rûhanî re hene, lê dîsa jî wan rêxistinên, berjewendiya giştî ya Komara Îslamî paraşt û Rûhanî ji aliyê berpîrsên bajêr û Besîc û Sipaya Pasdaran ve hat pêşwazîkirin.

Her dema ku serokkomarê Îranê diçe yek ji bajarên Sine, Kirmaşan, Ormiye yan jî Îlamê yê Kurdiştana Rojhilat, tenê hilbijartin tene bîra xelkê. Ne soza bicîkirina yasayên di warê zimanê dayîkê de dikevin holê û ne jî pêşwaziya wî ji aliyê rayedarên bajêr ve tê wateya pêşxistina bajar. Lê belê dengê herî kêr 8 milyon Kurdan jî bi kêrî wan tê ku zêdetirî milyonek kesên ji wan, mafê danganê hene.

Di salên derbasbûyî de çend xwepêşandanên mezin li Îranê hatin kirin ku li hemû



bajaran rastî êrîşa hêzên rejîmê hat û bi hezaran kes hatin şehîdkirin.

Ne Kurdan û ne jî neteweyên din, ew xwepêşandan ji bîr nekirine û lewma jî ji niha ve li her derî behsa baykotê tê kirin.

Di gerra berê ya hilbijartinên serokkomariya rejîma Îranê de bi heman rengê îsal, reformxwaz li Sine ji aliyê parêzgar Zahidî, nûnerên Sine di Parlamentoya Îranê de û rayedarên din ên bajêr ve hatibû pêşwazîkirin û ji xelkê re got, hikûmet îro mêvanê gelê bi rûmet û wêrek yê Kurd e. Ji ber pêgeha girîng û bilind a vî gelî û warê hêja, me biryar da piştî rêkvevtina etomî serdana Sine bikin û gelek pîrsgirêkên wan çareser bikin. Lê negot ka gelo ew pîrsgirêk çî ne û sedemên derketina wan çî ne! Wî diyar kiribû ku di serdanê de wê xwestek û pîrsgirêkên gel bîna guhdarîkirin û wezîr û rayedarên hikûmetê jî ku pê re ne, wê ji bo çareserîya pîrsgirêkan alîkar bin. Eger em behsa pîrsgirêkên siyasî nekin, herî kêr sedan gundan soza xizmetguzariyê ji Hesên Rûhanî standibûn û Rûhanî jî li ser texta dewletê rûnişt û wek hemû berpîrsên din ên rejîmê, guhdarekî baş bû lê bicîkarekî baş nebû.

Heriwsa pilana rejîmê ji bo kişandina xelkê bo ser sindûqên dengdanê ev e ku hilbijartinên civatên gund û bajaran bi hilbijartinên serokkomariya rejîmê re bi hev re tene birêveçûn.

Partiyên Kurd jî hertim ew hilbijartin baykot dikin û dibêjin para neteweyên ne Fars li Îranê, tenê kuştin û tepeserîkirin e. Ew didin xuyakirin madem meyal dabînkirina azadiyê di nav

sîstemê de nîn e, ewê jî wek 40 salên derbasbûyî, car din van hilbijartinan baykot bikin.

Rûhanî Tîrmeha 2016'an, got ku parêzgeha Kirmaşanê wê di warên, geştîyarî, pêtroşîmî, av, tîknolojiyên nûjenkirin û çandî de pêş bikeve û 45 plan, wê ji bo geşepêdana Kirmaşanê werin bicîhkirin. Lê niha piştî 5 salan, tenê 18 ji wan planan hatine destpêkirin.

Navbirî di derbarê hewlên xwe de ji bo vejandina gola Urmiyê dibêje ew gol, 120 cm kêr bûbû, lê min qewl dabû xelkê Urmiyê ku ez wê golê ji mirinê rizgar bikim, lewra min soza xwe bi cih anî. Min karî 10 cm ava gola Urmiyê bi lihemberdan ligel sala 2014'an zêde bikim û niha jî em di nava hewlên berdewam de ne bo zêdekirina ava hola Urmiyê. Lê berovajî gotinên wî, piştî heyekê dîsa aştî avê kêr bû û xuya dibe ku zêdebûna ava golê, tenê ji ber barîna zêde ya baranê bûye neku ji ber veguheştina avê ji bo wir yan jî bidawîkirina çêkirina bendavan.

Îlam ku weke “Bûka Zagrosê” tê naskirin zêdetirî 640 hezar donim dariştanên wê zincîre çiyayê lixwe digire ku 90 ji sedî ji wan dariştanan ber bi tinebûnê ve diçin. Li gor agahiyên Navenda Paraştina Jîngehê ya Îlamê, 10 ji sedî ji dariştanên Îlamê ku dibe 640 donim bi temamî hişk bûne lê heta niha sozên di derbarê rizgarkirina Zagrosê de nehatine bicîkirin. Lewma li bendê ye ku hezkiriyên Zagrosê li wir jî hilbijartinan baykot bikin.

Rûsiya û hewldanên sext



N: Ebdulazîz Qasim

Digel nêzîkbûna hîlbijartinên serokatîyê yê li Sûriyê, hin alî hewl didin ku helbijartinên serokatîyê li Sûriyê bi pêvajoya destûreke nû û bi karê komîteya destûra bîngehîn ya li Cenevrê girê bidin.

Ji aliyê xwe ve, Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov got ku biryara 2254 ya derbarê Sûriyê nabe rêgir li pêşîya hîlbijartinên serokatîyê, di korbenda “Val-dai” li Moskowê, Lavrov got, ku welatê wî di Biryara “2254” de ti deqekî “tekst” nabîne tede hatibe ku divê hîlbijartinên serokatîyê bêne encamdan piştî serraştîkirin yan nivîsandina destûrek nû jibo Sûriyê.

Hevdem ku hin welat, Amerîka di serî de, hewl didin ku zextê li civaka navneteweyî bikin da ku lidarxistina hîlbijartinên Sûriyê bêne paşxistin û encamên wê nayên pesindîkirin, û li gorî daxuyaniya Riyad Hedad balyozê Sûriyê li Moskowê ji bo ajansa Tass ya Rûsî ku encamdana helbijartinan bi rewşa Korona ve girêdayî ye, lê tevî wisa jî Rûsiya dibîne ku helbijartin û destûra nû du mijarên cuda ne.

Ji aliyekê din, hewlên Rûsiya yê ji bo qebûlkirina rejîma Sûriyê di nav komelgeha navdewletî û heta ya din kimkara Erebi de jî, rastî aştengiyên mezin tînin, bi taybetî ku biryara navnetewî 2254 dibe rêgir ji bo hewldanên şikandina dorpêça li ser rejîma Sûriyê.

Her ji destpêkirina destêwêrdana leşkerî ya Rûsiya di cotmeha 2016’an di Sûriyê de, Rûsiya ligel bizavên xwe yê leşkerî dest bi pêvajoyek



siyasî jî kir, bi rêya pêvajoya “Aştana”, di destpêka sala 2017’an de di navbera hin girûpên opozîsyona çekdar û rejîma Sûriyê de û paşî ev kongir bi beşdariya Îran û Tirkîyê wekî du aliyên gerantor ku Tirkîya wekî aliyê gerantor ji Opozîsyonê re û Îran wekî aliyê gerantor ji rejîmê re, û Rûsiya gelek hewldan mezaxtin ji bo pêvajoya Aştana bikî bi alternatîv ji pêvajoya Cenevrê û biryara navnetewî 2254 re, û li dawiyê Aştana bû encama sepandina dagîrkariya Tirkîyê û Îranê li ser Sûriyê, ku niha nêzîkî 11.75% ji xaka Sûriyê di bin dagîrkariya Tirkîyê û çeteyên wê de, û 25% di destê HSD de, û bi tenê 62.5% ji xaka Sûriyê di destê rejîmê de, bi parvekirin ligel hêzên Rûsiya, Îranê, girûpên şî’e û Hizbulah, bi awayekî ku rejîmê ti desthilat nemaye ne ji aliyê leşkerî û ne ji aliyê aborî, bi rêya sedan girêbestên aborî ligel Rûsiya û Îranê li ser çavkaniyên surûştî û aborî yê Sûriyê.



Hewldanên Rûsyayê yê ji bo piştgiriya rejîma Sûriyê berdewam in, bi rêya hewldanên derbaskirina rejîma Sûriyê di nav komkara Erebi de, nemaze bi rêya civata sêqolî ya vê dawiyê li welatê Qeter bi beşdariya wezîrê derve yê Tirkîyê jî, ku Rûsiya niha piştî asayîbûna têkiliyên Qater ligel dewletên Erebi nemaze ligel Erebiştana Siûdî, dixwaze hevpariyekî ligel dewletên Erebi peyda bike li şûna Îranê, piştî ku bi timamî ji bo Çînê hate firotin, herwiha ku hebûna Îranê dibe metirsî li ser ewlehiya Îsraîlê.

Lê ya xuya ye ku ne Rûsiya û herwiha ne Tirkîya jî, li rex Ereban ne cihê rehetîyê ne û nikarin bibin dost ji bo peyda kirina aramiyê û aştîyê, tevî hewldanên Tirkîyê ji bo asayîkirina têkiliyên xwe li gel welatên Erebi bi taybetî ligel Misrê, lê xuya ye ku dewletên Erebi amade nînin ji bo bibin hevpar ligel

Tirkîyê û ne jî ligel Rûsiya û Îranê, jiber ku Tirkîya û Îran çavkaniya têkbirina aştî û seqamgerî ne, û nikarin bibin hevpar di seqamgeriya navçeyê de.

Ji aliyek din ve, di kongirê Birokslê de hin dewletên (Humanitarian) soz dan bi bexşîkirina 6.4 milyar dolar ji bo piştgiriya xelkê Sûriyê, lê ev yek jî rastî nakokiyek Rûsî-Amerîkî hat, ku Amerîka û piraniya dewletên Encûmena Ewlekarîya NY tekez li ser girîngiya derbaskirina alîkariyên mirovî li ser mekanîzma sînore Sûriyê dikin, lê belê Rûsiya û Çîn di civînek asayî ya Encûmena Ewlekarîyê de ev yek red kirin û tekez kirin ku mekanîzma Netewên Yekbûyî serweriya Sûriyê binpê dike, û daxwaz kirin ku alîkarî bi rêya rejîma Sûrî ve werin derbas kirin.

Hevdem ya xuya ye ku rêveberiya Serok “Coe Bedin” dîtir pîteya caran bi doseya Sûrî nade û heta di nav de diyaloga kurdî-kurdî jî ji aliyê Amerîkîyan ve hatiye piştguhxiştin.

Amerîka di vê çarçoveyê de bêhtir bal dide çend doseyan mezintir wekî pîrsgirêkên wê yê ligel Çîn û Rûsyayê û herwiha doseya nukleerî ya Îranê, û pîtedana wê bi doseya Sûriyê dikeve di çarçoveya têkiliya doseya Sûrî ligel van hersê doseyan navhatî.

23 welatî di sala 1399'an de li Kurdiştanê bûne qurbanyê teqîna mînê

Navenda Amarî ya Saziya Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, di raporeke cudakirî ya amarî de, bas ji berçavtirîn haletên bînpêkirina mafê mirov di Kurdiştanê de li heyama sala 1399'an, dike.

Navenda Amarî ya Saziya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê, di rapora çaremîn a xwe de, haletên “qurbaniyên teqîna mînê di Kurdiştanê de li heyama sala 1399'an”, dixê ber bas.

Ew amare bi piştgirêdan bi haletên tomakirî li Navenda Amarî ya Saziya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê tê belavkirin û belkî amara rastî, pêka vê rêjeyê zêdetir jî be.

Di wê heyamê de 23 welatîyên sivîl bi sedema teqîna mînê di bajarên Kurdiştanê de hatine kuştin û birîndarkirin. (7 kuştî û 16 birîndar)

Herwisa 2 karmendlê mînhelgir li devera Sumar a Qesrîrînê bi sedema teqîna mînê hatine birîndarkirin.

9 kes ji hêzên Artêş û Întizamî, endamên Spah û

wezîfedar jî, li bajarê Dêwulan, sînore Mêhran, sînore Serdeşt, Merîwan û yek ji paygahên bajarê Seqizê bi sedema teqîna mînê hatine kuştin û birîndarkirin. (6 birîndar û 3 kuştî)

4 hêzên çavkaniyên jîngehî di parêzgeha Kirmaşanê de jî, di dema agirberbûna dariştana Merxîlê de bi sedema teqîna mînê hatine birîndarkirin.

Ronkirina zêde li derheq welatîyên medenî ku bûne qurbaniyê teqîna mînê:

6 kes li bajarê Îlamê, 5 kes li bajarê Kirmaşanê, 3 kes li bajarê Pîranşehrê, 3 kes li bajarê Baneyê, 2 kes li bajarê Urmiyê, 1 kes li bajarê Şinoyê, 1 kes li bajarê Serdeştê û 1 kes li bajarê Xûziştanê

2 kes ji birîndaran 2 zarokên 12 û 7 salî bûn.

4 kes ji birîndaran kolber bûn.

6 kes ji kuştî û birîndaran şîwan bûn.

1 kes ji birîndaran cotyar bû.



Mînen bi cihmayî yên heyama şerê 8 sale yê navbera Îran û Îraqê hemû sala dibe sedema kuştin û birîndarbûna hejmarek ji welatîyên ku li deverên ser sînor in. nêzî 42000 KM çargoşe ji erdê Îranê bi mînen bi cihmayî û karnekirî yên şerê Îran û Îraqê mînrêj e.

Hikûmeta Îranê jî her berdevame ji çekirin û çandina mînen dijî kesî û bi bereva-

jiya girêbestên navdewletî, li ser wê bawerê ye ku bi mifahwergirtin ji çandin mînan dikare ew sînore dirêj biparêze.

Pêka vê yekê sînoren Îranê digel Efqaniştan, Pakistan û Îraqê hatine mînrêjkirin; di meşa şerê sala 1360'an de li Kurdiştanê jî piraniya erdê wê deverê hatine mînrêjkirinê.

Amadekar: Evîn Mişefazade

Peydakirina şûnwar û asewarên dîrokî li bajarê Seqizê/ Talankirina wan ji aliyê rejîmê ve

Di wan çend rojan de şûnwar û asewarên gelek kevnar û dîrokî li taxa “Heme Ava” a Serê ya şehreka Mukiryan li rex dîwara hêza Întizamî ya Seqizê hatiye peydakirin, û rejîm jî di wê cihê de mijûlê kolanê ye.

Di wê cihê de komêk dîwarên kevin û goristan hatine peydakirin û heya niha jî, bilî komêk şûnwar, şûnwarê jin û mêrekî li rex hev peyda bûye ku dîroka wê bo pitir ji 5000'an berî niha vediger e.

Eva ku cihê nîgeraniyê ye, heya niha bi sedan cihê dîrokî û şûnwarên kevin li bajarê Seqizê hatine peydakirin, lê kes nizane ku çi bi ser wan de hatine, û ev jî aliyê rejîmê ve hatine talankirin. Ev şûnwarên niha jî, rejîm bi



henceta vê ku bajarê Seqizê çozexane nîne dibêje, emê bibine mozexaneya bajarê Sineyê, eva jî di halekê de ye, ku sedan car tiştên wiha rû dane û şûnwarên wiha bi mozexaneya bajarê Sineyê re nehatine dan.

Dîroka bajarê Seqizê bo pitir ji 7 hezar sal berî niha vedigere û bi sedan şûn û asewarên bê mînak tede hatine peydakirin û mozexane nîne, asewar ji aliyê rejîm û karbideştên wê ve tene talankirin.

Rejîm hertimî hewil dide ku şûnwarên dîrokî û asewarên kevin ji nav bibe, yan kes nizane çi bi ser wan şûnwaran de tê, şûnwarên dîrokî û asewarên kevin girîngî û cugrafiya her deverêkê nîşan dide û bo her welatekê girîngiyek taybet bi xwe heye.

Miqdad Midhet Bedirxan û rojanemya Kurdistanê



N: Keyhan Mihemedînijad

Nirxdan bi kultûr û dîroka gelê Kurd, erkê netewî û nîştimanî yê her Kurdekê ye.

Derbasbûyiya me gencîneyeke pir giranbiha ye. Herçiqas em diçine nav deryaya kultûr û dîroka xwe kesên pir weştiyayî û kesên neteweperwer û Kurdperwer têne dîtin.

Gelek ji wan xebatkaran ku ji bo netewa xwe ji bin destê dagîrkeriyê zigar bikin, ji bo çand, wêje, kultûr û dîroka gelê xwe xebatên bê hempa kirine, hin ji wan xebtakaran jî, ji malbata Bedirxaniyan in. Ew mirovên mezin û emegdar in û dibe em, bi nîfşa nû re, basa wan navdarên mezin bikin da ku ew jî wan mirovên mezin nas bikin.

Bedirxaniyan di pêxema dîroka gelê xwe de gelek ked dane, wan bi afirandina Elfaba Kurdî, rojnameya Kurdî û bi sedan tiştên din re kar kirine û zehmet kêşane û weştiyane. Ew di warê siyasî de jî pêşengê hişyarkirina civatgeha xwe bo berevanîkirin li mafên xwe yên netewî bûn. Di warê revşenbîrî de pêşengê belavkirina nûxwazî bûn û li dijî nezanî û nexweşî wan xebat kirin. Ew di edeb û hunerê de jî pêşeng bûn. Bo nirxdan bi kultûra Kurdî her dîsan ew pêşeng bûn. Ew bûne pêşengê jojnamegeriya Kurdî û serhildanên rizgarîxwaziya netewa Kurd. Nîfş bi nîfşên malbata Bedirxaniyan xebatên mezin kirin û yek ji endamên wê malbatê ku bo cara yekê rojnameya Kurdî bi navê Kurdistan çap û belav kir, Miqdad Midhet Bedirax bû.

Ka em balê bidin li ser çîroka rojnama Kurdistan û Miqdad Midhet Bedirax. Li sala 1890an dewleta Osmanî dest dike bi asmîlekirina Kurdan û mîrên Kurd bo Stenbolê gazî dike û nahêle ti mîrek desthilat-

dariyê bigire dest û bi wî awayî siyaseta helandina netewa Kurd bi rê ve dibe û givaşeke zêde dixê ser Kurdan, her lewma di vê pêwendiyê de, gelek Kurdên rewşenbîr û zana û neteweperest, Tîrkiye û Kurdistanê bi cih dihêlin û diçine welatên bîhanî û jiyan û xebata xwe di xerîbiyê de derbas dikin.

Yek ji wan kesên rewşenbîr, zana, Kurdperwer û neteweperwer, Miqdad Midhet Bedirxanê kurê Mîr Bedirxan li sala 1891an ber bi welatên bîhanî ve diçe û heta digihe welatê Misrê. Miqdad Midhet Bedirxan li welatê Misrê, li pêxema berjwendiyên gelê Kurd û nasandina doza gelê xwe bi cihanê û bi mebeştî berevanîkirina li Kurd û rûbirûbûn di hember Sultanên Osmaniyan, û hişyarkirina xortên gelê Kurd, di Qahîreyê de xebata xwe berdewam dike. Her bi wan mebeştan ev hizir dike ku rojnameyekê biweşîne û bi wî awayî bona hişyariya netewî kar bike. Ev jî ev bû ku di meha Avriyîla 1898'an, yekem hejmara rojnameya Kurdistanê weşand. Ev rojnameye bû bi destpêk û pêşenga dîroka rojnamevaniya Kurdî.

Miqdad Midhet Bedirxan tê ser wê bawerê ku bona gihîştin bi serbixweyî û rizgarîkirina yekcarî, hewce ye gel ji rêya şoreşa rojnamevanî ve bête hişyarkirin û rewşenbîrkirin.

Miqdad Midhet Bedirxan li ser hejmara yekem a rojnameya Kurdistan mebes ji weşana wê rojnamê di gotarekê de nivîsiye û rohnkirinek bi vî awayî dide û nivîsiye: Kurd ji gelek netewan zêdetir xwedan bîr û hişmendî ne, mîrxas in, di ola xwe de rewya û bihêz in, lê mixabin wekî netewên din xwendevan û dewlemend nînin, nizanin cîranên wan çawan in û çî dikin û agehdarê wan nînin, lewma me piştgirêdan bi Xwedê ew rojnameye nivîsî û bi piştevaniya Xwediyê mezin li her 15 rojan carekê emê belav bikin. Navê rojnameya me jî “Kurdistan” e û em ê di wê rojnamê de qazancên zaniştê û zaniyariyan bas bikin, li her cihekê mirov hebe, li her cihekê xwendîgehên baş hebin ez ê nîşana Kurdan bidim û li her cihekê şer dibe û helwesta welatên mezin çî dibe û çawa şer dikin, çawa bazirganî dikin, ez ê hemûyan bas bikim, heta niha



çî kesê rojnameyeke wiha belav nekiriye”.

Di dema weşana hejmara yekem a rojnameyê de Miqdad Midhet Bedirxan kartek bi Feransî nivîsiye û armanc û mebeştên xwe tede rohn kiriye ku digel hejmara yekem de bo wan kesan şandiye ku rojname bo wan şandiye û deqa nivîsîna li ser wê kartê wiha bûye:

“Gewrem ez gelek bextiyar im bo wê ku hejmara yekem a rojnameya Kurdistanê bo we dişînim û eva her niha di Qahîreyê de hatiye damezrandin. Netewa min ku netewa Kurd e hejmara wan 6 milyon kes e û di Asiyaya piçûk de zimanê wan gelek kevin e, eva yekemîn car e min bi wî zimanî ew rojnameye belav kiriye, ew jî bo mebeştî têgihandina zaniyarî û handan Kurdan bo wê ku rêya pêşketin û şarîstaniyeta nû bigrin û di heman demê de wêjeya netewa xwe nîşanê netewên dinê bidin. Bavê min Mîr Bedirxan li şerê serbixweya Kurdistanê de beşdar bû û dijî hikûmeta Ebdulhemîd, ev kesê ku jiyan malbata me di nav nîştimana me de qedexe kiribû. Ji ber vê min rû kire Qahîrê û lewma ez dixwazim nîzam û asayîş balê bi ser Kurdistanê de bikêşe, min biryar da ji rêya wê rojnameyê ve tev şiyana xwe ji dûr ve terxan bikim bo hemû karekê ku qazanc û bextiyarî û perwerdekirina hizir tede be bo welatîyên Kurd”.

Mîr Miqdad Midhet Bedirxan tev hewla wî ji avakirina wê rojnamê eva bû ku ji rêya rojnamê ve netewe û lawên Kurd hişyar û çavekirî bin û herwisa revşenbîrî û zaniştê di nav gelê xwe de belav bike.

Di serdemê weşana Rojnameya Kurdistanê de wê demê dewleta Osmanî çavdêriyeke tund li ser wê rojnamê dikir û hatina û belavkirina wê rojnamê bo nav Kurdistanê de qedexe kiribû û her lewma Miqdad Midhet Bedirxan hejmarên wê rojnamê ji rêya bazirgan û saziyên nihînî ve digihande Kurdistanê. Dewleta Osmanî dixwaşt Miq-



dad Midhet Bedirxan û Ebdulrehman beg ê birayê wî wekî tawanbar di Stanbolê de dadgehi bike, û her lewma jî gefên zêde li ser wan du xortên Kurd bû. Miqdad Mithet Bedirxan bi damezrandin û weşana rojnameya Kurdistanê, gelek ciwanên Kurd li zilm û serkutkariya ku Osmaniyan bi ser Kurdan de dianîn hişyar kirin û ew di warê wêjeya Kurdî û dîroka Kurd de jî hişyar kirin.

Ew rojnameye dibe mezintirîn dujminê Osmaniyan. Osmanî jî kevtine dijayetîkirina wê rojnamê û çendîn caran daxwaz ji welatê Misrê kirin ku dabixin û her lewma Miqdad Midhet bi hemû awayekî kevte dijayetîkirina Osmaniyan û bo berevanîkirin li rojnameyê gelek cih guherîn.

Miqdad Midhet Bedirxan di wê rojnameyê de gelek çîrokên wekî Mem û Zîn, helbest û pexşan û gelek gotar û nûçe tede belav dikirin.

Bilî wan gotarane jî Miqdad Midhet nêrxekî zêde dida pirs-girêkên rewya yên gelê Kurd û ciwanên Kurd han dida ku dijî desthelata Osmanî bisekînin. Çend mijar û gotarên girîng ku Midhet Bedirxan wê demê di rojnameya Kurdistanê de belav kirin wiha ne:

Ji rêya hejmara sê ve sala koça dawî ya Hacî Qadir Koyî hate peydakirin û helbestek Hacî Qadir Koyî tede belav kirine û di pêşekiyê de hatiye nivîsîn, sala par Hacî Qadir Koyî koça dawî kiriye wate sala 1898an hejmara 3an hatiye weşandin û sala par jî dike 1897an, li ber wê hindê sala koça dawî ya Hacî Qadir Koyî hatiye zanîn.

Di rojnameya Kurdistan de şerê digel Ermeniyan şermezar kirine û red kirine, banghêjiya birayetiya di navbera Ermenî û Kurdan kirine.

Piştî derbasbûna salek bi ser weşana rojnameya Kurdistanê, Miqdad Midhet nexweş dikeve û Ebdulrehmanê birayê wî diçe Swîsê û serpereştiya rojnameyê dike.

Miqdad Midhet Bedirxan bi avakirin û weşana rojnameya Kurdistanê dîsan îsbat kir ku malbata Bedirxaniyan netenê di Botanê de belkî li her ciheke cihanê bin dikarin li ser hişyarkirina Kurdan, çand, dîrok û wêjeya Kurdî xwedî bandor bin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Amarî 10 sale ya kuştina kolberan di Kurdistanê de

Navenda amarî ya Saziya Mafî Mirovî ya "Kurdpa"yê, xîşteya amarî ya 10 sale ya kuştina kolberan di Kurdistanê de belav kir. Pêka vê xîşteyê, di deşpêka sala 1390'an heya dawîya sala 1399'an de, bi giştî 1506 kolber di Kurdistanê de hatine kuştin û birîndarbûnê.

Kuşti: 515 kes

Birîndar: 986 kes

Bê serûşûn: 5 kes

Di vê xîşteyê de, bi cudakirina salan (ji deşpêka sala 1390'an heya dawîya sala 1399'an), hejmara kuştî û birîndarbûyan hatiye.

Sala 1390'an; 94 kuştî û birîndar (43 kuştî, 51 birîndar)

Sala 1391'an; 74 kuştî û birîndar (43 kuştî, 31 birîndar)

Sala 1392'an; 102 kuştî û birîndar (44 kuştî, 58 birîndar)

Sala 1393'an; 89 kuştî û birîndar (38 kuştî, 51 birîndar)

Sala 1394'an; 58 kuştî û birîndar (29 kuştî, 29 birîndar)

Sala 1395'an; 145 kuştî û

birîndar (66 kuştî, 88 birîndar)


Sala 1396'an; 212 kuştî û birîndar (58 kuştî, 152 birîndar û 2 bê ser)

Sala 1397'an; 265 kuştî û birîndar (79 kuştî, 183 birîndar û 3 bê serûşûn)

Sala 1398'an; 227 kuştî û birîndar (57 kuştî, 170 birîndar)

Sala 1399'an; 231 kuştî û birîndar (58 kuştî, 173 birîndar)

Amara 10 sale ya kuştina kolberan di Kurdistanê de
Kuşti 520 û birîndarbûn 986



Awayê kuştin û birîndarbûna kolberan:

Kuştin û birîndarbûn bi teqarasteraşt ya hêzên leşkerî: 1101 halet

Kuştin û birîndarbûn bi sedema berbûn ji bilindahiyên ve: 94 halet

Canjideştdan û jehrawîbûna kolberan bi sedema man di bin berf û bager û reniya befrê de: 80 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan bi sedema teqîna mînê: 75 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan bi sedema kevtina navçem bi taybetî li encama lipeykevtina hêzên leşkerî: 14 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan bi sedema lêdar û îşkenceyê ji aliyê hêzên leşkerî ve: 9 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan bi teqeya hêzên leşkerî yê Tirkîyê: 17 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan bi sedema lêdan û îşkenceyê ji aliyê hêzên leşkerî yê Tirkîyê ve: 1 halet

let Canjideştdan bi sedema sekîrandina dil yan jî giraniya bar di dema kolberiyê de: 14 halet

Kevtina bar bi ser kolberan de: 1 halet

Bê serûşûn: 1 halet

Qutbûna benda maziye pişt di dema kolberiyê de: 1 halet

Gazgirtin li nav xîvetê di encama kolberiyê de: 1 halet

Nadiyar: 2 halet


Birîndarbûna kolberan li bûyera hatûçûnê di dema kolberiyê de: 91 halet

29 kes ji kolberên kuştî û birîndarbûyî, temenên wan di bin 18 saliyê de bûn.

73% ji wan kolberan bi teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî yê hikûmeta Îranê hatine kuştin û birîndarkirin.

Kuşti û birîndarbûn bi sedema berbûn ji bilindahiyên bi rêjeya 6%î, pileya duhemê bo xwe misoger kiriye.

Herwisa kuştî û birîndarbûn bi sedema teqîna mîn û sir û seqemê her yek ji wan bi rêjeya 5%î, pileya sêhem bo xwe misoger kiriye.



Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (395)

PÊŞEWA QAZÎ

BEJNEK JI ÇINARA JIYANÊ Û

TIRÎJEK JI AZADÎ

ARAMÎ Û AŞTÎXWAZÎ Û

SÎMAYEK JI

SERNETEWANDIN Û XWERAGIRÎ YE



DEZGEHA RAGIHANDINA

GIŞTÎ YA PDKÎ